

Karkerên hemû welatan û gelên bindest yekbin!

# NIŞTIMAN

Sal: 1992  
Meh: Nisan  
Hejmar: 21  
Biha: 15 Skr

Serxwebûn Demokrasi Sosyaliizm Yekiti





## REDAKSIYON

B.Bêwar  
Mîrza Pîran  
Nedim Cihat  
Şayîn  
Z.Zana

Navnîşan/Adress:  
Box: 7031  
164 07 Spånga - SWEDEN

Postgiro: 98 66 50 - 0

Abonetî/prenumeration:  
Kes: 150 Skr. Sal/Âr  
Maçam/Myndigheter: 200  
Skr/Âr

Redaksiyon ji nivîsarê bi îmze ne  
berpirsiyar e.

Nivîsarên ku ji Niştîman re tèn  
şandin, eger çap jî nebin, li  
xwedî  
nayên vegerandin.

Sal: 1992  
Meh: Nisan  
Hejmar: 21  
Biha: 15 Skr.

## NIVÎSARÊN VÊ HEJMARÊ

Beşa Kurdî	Rûpel
Di Tevgera Kurdistanê de Pîrsa Rêxistinîyê ....M.Pîran	3
Newroz Pîroz be	9
Destûra Giştî û Peymana Neteweyî ya Xoybûnê	24
Zazakî	11
Beşa Tirkî	Rûpel
Türk Devleti Kürdistan da....Redaksiyon	13
Güney Kürdistan ve....J.Erdem	16
Kürdistan da "Devlet, Konter-Gerilla...."	19
Newroz	21
G.Antep Özel Tip Cezaevinden .....	23

## DI TEVGERA KURDISTANÊ DE PIRSA RÊXISTINIYÊ Û LÊNERÎNEK KURT LI SER PARTIYA DEMOKRAT A KURDISTANA TIRKIYÊ (PDKT- KUK)

### KURDISTANA ROJAVAYA BAŞÛR (SÛRIYE)

-3-

#### Mîrze Pîran

P îştî peymanên bi dizî yên di nava dewletên emperyalîst û şerê Cîhanê yê yekem; di sala 1923- an de, bi "Peymana Lozanê" Kurdistan bi awakî eşkere û "fermî" careke din hate perçe kirin. Îranê perçê ku di bin destê wê de bû, parast. Perçê herî mezin yê Kurdistanê jî Tirkîyê re ma. Başûrê Kurdistanê kete bin destê Îngilîstan û rojavaya başûrê Kurdistanê jî, di bin nîrê Fransayê de ma. Di sala 1936- an de, bi damezirandina dewleta Sûriyê, rojavayê başûrê Kurdistanê (Kurdîstana Sûriyê) di nava sînêrên wê dewletê de ma.

Bê guman, gelê kurd li hemerî wan bûyer û kiryarên qirêtiyê bê deng nedima û serî jî dijmin re neditewand. Çi beriya wê Peymanê û çî jî piştî wê be, ji bo bidestxistina heqên xwe yên neteweyî tekoşîna xwe didomand û serhildanên gelê kurd li gelek navçeyên Kurdistanê berdewam bûn. Lê mixabin, ji ber ku ew tevger û serhildanên kurdan jî rêxistinên ku bikaribin bi gelek awayî pêşengiya wan bikin bê par bûn û ji ber sedem û mercên hundir û derve, nedigihast armancên xwe û pirê caran bi trajediyên mezin "dawi" dihatin.

Di wan rewşê weha dijwar û trajedîk de, di sala yê xwedî li gelê kurd û pêşengên wî yên leşkerî û siyasî derdiketin, çiyayên Kurdistanê û gelê kurd bi xwe bûn. Gava li perçakî Kurdistanê serhildanek bi ser nediket û dişkêst, ya jî gava zilm û zoradariya dijmin li navçeyekê diwartir dibû; di sala yê sitarî li gelê kurd, rewşên bîr û pêşengên wî dikir, perçên Kurdistanê yên din bûn. Loma jî; bi taybetî gelek rewşên bîr û pêşengên siyasî yên kurdîstana Bakur ku ji neçarî dev ji ciwarên xwe berdidan, derbasî Kurdîstana Sûriyê dibûn. Ji ber wê yekê jî; Kurdîstana Sûriyeyê di warên siyasî, ziman û kulturî de, roj bi roj bêtir dibû navçeyek zor girîng û navendiyek siyasî.

#### HEWILDANÊN KONGREYA NETEWÊYÎ

Di Şerê Cîhanê yê yekem de, gelek

pêşeng û endamên rêxistinên kurdan ku li Stanbolê hatibûn damezirandin, li hemberî zilm û zordariya dijmin xebatên xwe yên siyasî û rêxistinî dabûn rawestandî û derbasî Sûriyê bûbûn. Bi taybetî piştî hêzin Hukûmeta Mustafa Kemal ku li hemberî Yûnaniyan bi ser ketin; terora xwe ya li ser hêz û rêxistinên ku li hemberî wan bûn, diwartir kirin. Ji wê zilm û zordariyê, rêxistinên kurdan û pêşengên wan jî bê par nediman. Li gorî agahdariyên ku Zinar Silopî dinivîsîne: ji ber wan hoy û sedeman, "Komela Tevgerêdana Cîvaki ya Kurd" (Kürt Teşkilatt-i İctimaiye Cemiyeti) civîna xwe ya talî civand û gihastin wê baweriyê ku êdî li bajarên Stanbolê û İzmirê îmkânên xebata wan nemaye. Ji ber wê jî, biryar da ku hemû endamên wan yên Navendî herdu bajaran terk bikin. "Partiya Neteweyê Kurd" (Kürt Millet Firkasi) jî, li gorî "Komela Tevgerêdana Cîvaki ya Kurd" dimeşîya. Ji xwe, "Komela Pêşketina Kurdistanê" (Kürdistan Teali Cemiyeti) xebata xwe jî binî de, rawestandibû.

Yek ji wan kesên siyasî ku di wê demê de derketibû derveyî welêt, berpirsiyarekî "Partiya Neteweyê Kurd" Îskender bû. Îskender bi navê "Ligue Kurd", jî "Konferansa Neteweyên Bîndest" (Les Natio Opprim) re ya Belçikayê civiyabû, gelek nivîsandin şand û di wan nivîsandinan de, bahsa zilm û zordariya li ser gelê kurd û doza serxwebûn û heqê neteweyî dikir.

Piştî şikestina serhildana Şêx Said, Îskender jî bo gotûbêjên li ser rewşa nû û çareserkirina pirsgirêkên li pêşîya tevgera rizgarîxwaziya neteweyî, Dr. Mehmed Şukrî Sekban, Îhsan Nûrî, Cîhat, Rasimê Wanî, Xûrîstê Hertûşî û hinek niştîmanperwerên din yên Kurdîstana Bakur dibûn. Di netîca wan hevdiîtan û gotûbêjan de, nerîna civandina kongreyek giştî dikeve giraniyê. Îskender di wî warî de, têkilî bi layê Şêx Said, Alî Rîza re jî datîne û baweriyên

wî yên ku piştigirîya kongreyek weha dike, digre. Ji dervî wan danûstendin û peywendîyan Îskender, ji serokeşîrê Beraziya Mustafa Şahî Beg û hinek serokeşîrên din yên ku piştigirîya doza Kurdistanê dikirin, soza beşdariya kongreyê bibin digre. Herweha têkiliyên Îskender, bi Ermenîyan jî re hebû. Ji xwe hîn di dema "Peymana Sevrê" de, ji bona hevkarî û piştigirîya doza kurd û ermenîyan danûstendinên germ di nava nûnerên wan Şerîf Paşa û Nobar Paşa de, çêbûbûn.

Ji bona hemû hêz, rêxistin û kesên navdar yên welatparêz beşdarî kongrê bikin, di nava salên 1926 û 1927- an de, xebat û hawildanek taybetî hate meşandin. Beriya kongrê gelek civînên navçeyî hate çêkirin ku wan hêz û kesên nakokî û dijîtî di nava wan de hebûn, lihevbin. Bi kurtayî, şert û mercên pêkanîna civîna giştî, di gelek waran de hatibûn stewandin û niştîmanperwerên kurdan bi bêaramî li benda civandina wê kongrê bûn (1).

Di wî warî de, Garo Sasuni weha dibê: "Piştî şikestina serhildana Şêx Said, hinek ronakbîr û pêşengên leşkerî yên kurd bi gelek tekoşeran ve îlticayî Îranê, Iraqê û Sûriyeyê kiribûn. Li wan deran hinek şoreşgerên kurdan yên ji berê de mabûn, hebûn. Berî wê serhildanê, rêxistînek wan ya ji peywendiyên rêxistinî bê par û bi navê "Lîga Neteweyî ya Kurd" hebû..."

"Hema piştî şikestina Şêx Said, êdî damezirandina rêxistînek neteweyî û giştî ya kurd acil û pêwîst bûbû. Hinek navçeyên girîng yên kurdan hîn ala serhildanê dananibûn; wan bi serê xwe û ji peywendiyên bi hev re û ji eniyek giştî ya neteweyî bê par, şerên xwe didomandin..."(2).

#### KONGREYA GIŞTÎ YA NETEWÊYÎ Û DAMEZIRANDINA RÊXISTINA KOYBÛNÊ

Di dawîya wan têkilî, hewildan û gotûbêjan û di Îlona 1927- an de, "Kon-

greya Giştî ya Neteweyî" li bajarekî biçûk yê Lubnanê, li Bihamdunê civiya. Kongre, di bin serokatîya Dr. Şukrî Mihemed de dihate meşandin. Li gel rêxistinên kurdan, hinek serokeşîrên jî Kurdîstana Tirkîyê, K. Iraqê û K. Sûriyeyê, nûnerên herêmên ku serhildan lê berdeambûn û ji hinek welatên derve jî, gelek rewşenbîr û niştîmanperwerên kurdan, di kongrê de beşdar bûbûn (3).

Li gorî Vedat Şadîlî, hinek kesên navdar yê beşdarî Kongreya Lubnanê bûbûn ev in: Celadet Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Mendûh Selîmê Wanî, Şahînzade Mistefa, Mutesarifê Meletê Xalî Fehmî, Fehmîyê Licê, Mêhdî (bi-rayê Şêx Saîd), Abdulkêrimê Silêmanîyê, Haco, Emînê Ramanî, serbazê berê yê Dewleta Osmanî Xurşîd (4).

Her çiqasî beşdariya Kongrê ne hew ji perçê Kurdîstana Bakur jî bû, lê di rastiya xwe de, Kongre di giraniya pêşengîya ronakbîr û pêşengên wî perçî de, hatibû amade kirin. Teva wî awayî jî, Kongre çî di warê şikil û berfirehiya beşdariyê de û çî jî di warê biryar û encamên xwe yê siyasî de be, civîneke gelek girîng û bi serketî bû.

Di wê Kongrê de; di 5-ê Îlona 1927-an de, biryara damezirandina rêxistina siyasî û neteweyî "Xoybûn", amadekirina armancên siyasî û destûra wê rêxistinê û "Peymana (sûnda) Neteweyî" hate girtin. Bi wî awayî; rêxistin û hêzên siyasî, rewşenbîr û niştîmanperwerên kurdan, di nava yek rêxistina siyasî û neteweyî de, beşdar dibûn.

Armanc û mercên beşdariya Xoybûnê, di "Destûra giştî û Peymana Neteweyî" de, weha hatiye diyar kirin:

#### ARMANC:

1) Bi biryara Kongreya Kurdî ya yekem, ku di 5-ê Çiriya Pêşîn de civiya, bi navê Xoybûn rêxistînek neteweyî hate damezirandin.

2) Armanca Rêxistinê; rizgarkirina kurd û Kurdîstana di bin nîrê Tirkîyeyê de û di nava sînorên xwerestî û neteweyî de, damezirandina dewletek serbixwe ya Kurdîstanê ye.

3) Ji bo gihastina wê armancê, Rêxistin wê hemû kurdan li dora xwe bicivîne û li ser bîngê û çarçewa berjewendiyên dualî, bi her cûr alîyan re têkiliyan dîne.

#### MERCÊN BEŞDARIYÊ:

4) Her kurdekî ku peyman (sûnda) Kurdî ya neteweyî û fermanên wê destûrê bipejirîne û bicianîna pêwîs-

tiyên wê teahut bike, dikare beşdarî nava Rêxistina Xoybûnê bibe.

Her kes, gava beşdarî nava Rêxistinê bibe, divê heqekî beşdariyê bide û endametiyeke mehê qebûl bike.

5) Her kesekî ku beşdarî nava Rêxistinê bibe, ji aliyê heyetek xwedî destûr ve bi wê sûnda li jêr, tê sûnd dan. Endamên wezîfedar yê Rêxistinê ku bi serê xwe dikarin bi karê Rêxistinê re rabin, wê sûndê wek teahutnamê bi wan kesên ku wê binin nava Rêxistinê didin nivîsandin û îmze kirin.

"Ez li ser şeref û namûsa xwe û bi xwedê sûnd dixwim, ku li kî derê dibe bila bibe û serê min jî tê de here, ez dê hemû fermanên ku ji alî kes û heyetên xwedî selahiyetdar yê Rêxistinê hên dan, eyne û herf bi herf bi cî binim; ez dê ji binî de, dev ji bîr û baweriyên şexsî û endametiya Rêxistinê ku heta niha ez endamim, berdim û ji bo bîdestxistina armancên neteweyî, hew bîr û baweriyên Rêxistina Xoybûnê biparêzim.

Ez dê sir û razên ku bi giştî wek endamekî Rêxistinê û bi taybetî bi riya wezîfeyên ku bê dayin, pê bihisim, eşkere nekim. Bi çî awayî dibe bila bibe, di rewşên eşkerekirina sir û razan û bicînanîna fermanên Rêxistinê de, ez dê bi her cezayê ku li min bê birtin, razîbim û eger ferman bê dayin, ez dê bi xwe wî cezayî li ser xwe bi cî binim."

Li gorî Garo Sasunî dinivîsîne; Kongre, Komîta Navendî ya Xoybûnê hildibijêre û wê Komîtê wek "Hukûmeta Neteweyî ya Kurdîstanê" îlan dike. Berî ku Kongre dawî were jî, di Kongreyê de, du belavok tê amade kirin. Belavokek ji wan jî bo raya giştî bû û ya din jî, ji bona pêşkêşkirina Sosyalîst Enternasyonalê bû. Belavoka yekem ji alî Garo Sasunî de, bi kortayî weha hatiye nivîsandin:

"1- Ji ber rewşa kurdên di bin despotiya sazûmanîya Tirk ku nayê tehamul kirin û pêkanîna qirkirinê berfireh û ji ber daxwaza jiyanek serbixwe û azad ya Neteweya Kurd, Kongreya yekemîn ya Kurd biryara rizgarkirina Kurdîstana Tirkîyê û damezirandina dewletek serbixwe daye.

2- Kongre hêvidare, ku Îngilîz û Hukûmeta Iraqê piştigiriya daxwaza di nava Iraqê de pêkanîna otonomîyê navçeyî ya kurd ku ji aliyê Koma Neteweyan ve hatibû pêşkêş kirin, bikin.

3- Kongre, ji bo bi dilsozî qebûl

kirina penaberên kurd yê ku ji ber zordariya Tirkîyê neçar man ku koç bikin, minetdariyên xwe pêşkêş hukûmetên Îngilîstan, Fransa, Sûriye, Iraq û Îranê dike.

4- Kongre ji her kesî re dide diyar kirin, ku ji sednsalan û vir de Kurd û Ermenî li Kurdîstan û Ermenîstanê dijîn. Gava ew ji bo sexwebûna xwe dixebitin, ew hemû serdestî û girêdayînen biyanî ku bixwazin welatên wan bi xwe ve girêbidin, red dikin. Ji ber ku ew herdu welat, hew yê neteweyên Kurd û Ermenîyan ne" (5).

Li gorî destûra Rêxistinê û wê belavokê jî, diyar dibe; ku Rêxistina Xoybûnê wek esas û bîngê, armanca serxwebûna perçê Kurdîstana Tirkîyê dabû pêşîya xwe. Ji xwe; Rêxistina Xoybûnê jî, li gorî wê stratejiyê dest bi xebat û tekoşîna xwe kir. Li Kurdîstana Bakur ji serhildana Şêx Saîd û vir de li Çapakçûrê, Farqînê, Sasînê û Agrî, teva ku ne navendî û xwedî têkiliyên Rêxistinê jî bûn, şerên herêmî li hemberî Tirkan dom dikirin. Xoybûn dixwest ku wan tifikên berxwedanê, di warê teknîkî û Rêxistinê de di bin programekê bicivîne û wan hêzên jîndar ji bo gihastina armancên neteweyî jî nû de bihûne.

#### DI SERHILDANA AGRÎ DE ROLA XOYBÛNÊ

Gava Xoybûn dest bi wê xebatê dikir, serhildana Agrî jî, roj bi roj gûr û geştir dibû. Îhsan Nûrî Paşa ji Iraqê direve û piştî gelek asteng û zahmetiyên, xwe digihîne Çiyayê Agrî. Piştî beşdariya Îhsan Nûrî Paşa, di warê tevgerêdan û disîplîna leşkerî de, rewşa canbêzarên kurdan gelekî baştir dibe. Di demek kin de, Îhsan Nûrî Paşa xwe bi derdora xwe dide hezkirin û dibe pêşengekî tevgera Agrî.

Hukûmeta Tiriyê, ji wê rewşê gelek aciz dibû û xofek mezin ketibû dilê dijmin. Wan dixwest, ku berî ew tevger bêtir xurt û berfireh bibe, wê bi lez û bez û bi tevayî vemrîne. Loma jî, Tirkan çend caran bi hêzên giran êrişî ser tevgera Agrî kirin. Lê di wan êrişan de bi ser nediketin. Gava Hukûmeta Tirkîyê dîtin ku hew bi êrişên leşkerî nikarin wê tevgerê biteffine; di 19 ê Hezîrana 1927-an de û bi hejmara 1097-an zagonek taybetî ya sirgûnê derxist. Wê Zagonê destûr dida Hukûmetê ku "Ji ber sedemên leşkerî, idarî û civakî û ji navçeya Rojhilat ya awarte û wîlayeta Beyazîtê qasî 1400 kesan û malbatên wan, 80 malbatên asî û mahkûmên



cezagirana koçî wîlayetên Rojava bikin". Herweha li gorî wê Zagonê, pêwîst bû di nava du mehan de ew kiryara bihata bi cî anîn (6).

Di 13 Îlona 1927- an de, dijmin bi 10 hezar leşker û çekên giran digre ser Agrî û di nava leşkerên dijmin û hêzên kurdan de, şerekî gelekî mezin û dijwar dest pê dike. Ew şerê mezin, heta 20 ê Îlona 1927- an dom dike. Di wî şerî de jî, canbêzarên kurdan berxwedanek hêja û mîrxasiyek mezin nişan didin; hêzên dijmin dişkinin û leşkerên kolonyalîstan bi zerarên gelek mezin neçar dibin, ku paş de vekşin.

Piştî wê serketina mezin, pêşengên tevgera Agrî li çiyayê Agrî komcivînek mezin çêdikin. Di derheqê wê "Komcivîna Neteweyî ya Kurd" de, rojnamevan û nivîskar Emin Karaca weha dinivîsîne: "Di wê civînê de hate diyar kirin, ku serxwebûn wek armanca binge-hî hatîye qebûl kirin. Vatîniya birêvebirina vî şerê serxwebûnê, didin sermilên rêxistinê û balê dîkşînan ser girîngiya hevkarîya ku Kurd bi Ermaniya jî re bikin. Ev civîn bû wek civînek daîmî û neteweyî; bû wek parlemento ya Agrî û hukûmetek neteweyî hilbijart. Du pêşengên girîng yê jî vî civînê, İbrahim Huskê Telli dikin berpişyarê birêvebirina siyasî, İhsan Nûrî paşa jî dikin fermandarê giştî yê leşkerî yê tevgera Agrî. Piştî wê komcivîne bi demekê, Tevgera li çiyayê Agrî jî beşdarî nava rêxistina Xoybûnê ku li Lubnanê hatibû damezirandin bû..." (7).

Gava Xoybûn dibihîze, ku İhsan Nûrî Paşa beşdarî nava serhildana Agrî bûyê; wî wek "Nûnerê Leşkerî yê Agrî û Fermandarê Giştî yê Tevgera Neteweyî" tayin dike. İhsan Nûrî Paşa, li gel perwerdekirin û nûjentiya hêzên leşkerî yê neteweyî, bi îmkânên gelekî kêmtir dest bi weşana rojnama "Agrî" dike. Di wê rojnamê de, gelek nivîsên hêja li ser têkoşîn û xebata tevgera neteweyî, tê weşandin.

Çavkaniyek leşkerî yê Dewleta Tirkîyê di vî derheqê de weha dinivîsîn: "Dema Rêxistina Xoybûn (di Îlona sala 1927- an li Lubnanê, li navendiya Bihandun hate damezirandin û heta sala 1939- an hebûna xwe domandîye) dibihîze ku İhsan Nûrî gihaştîye Agrî wî wek "Delegeyê Leşkerî yê Agrî û Fermandarê Giştî yê Tevgera Neteweyî" tayin dikê. Xoybûn jî bo alîkariya Tevgera li Agrî texsîr nedikir: Li gel çek û cebîlxaneyan, çapxaneyek

kevn jî hate şandin. Bi gihaştina Makîne, bi navên "Agrî" û "Gaziya Welat" du rojname weşandin û pê propoganda tevgera xwe kirin. Ji xeyrî wê, bi sernivîsa "Agrî Agir Dibarîne" bultenek hate çap kirin û armancên serhildanê tê de weşandin. Ew bultena hem di nava welêt û hem jî li derveyî welêt hate belav kirin ku raya giştî çêbikin. Di vî navbêne de sistemek bêtêlê jî hate ava kirin" (8).

Lê, Vedat Şadilî bi zanebûn agahdariya ku ji wê çavkaniyê girtiye hinekî diguherîne û dixwaze bi wî awayê tevgera Agrî wek pêgirtiyê îngilîzan û dewletên emperyalîst nişan bide: "Xoybûn şebekak telsîzê û makînak çapxanê ku jî îngilîzan girtibûn, dişînin Çiyayê Agrî û dixin bin destên İhsan Nûrî. Bi wê makîna çapxanê li Çiyayê Agrî bi navê "Gaziya Welat" rojnameyekê derdixîne û xwestine ku armancên xwe jî xelkê herêmê re diyar bikin. Li gel wan xebatan, Rêxistina Xoybûn bi navê "Agrî Agir Dibarîne" bultenekê diweşîne û daxwazê jî dewletên emperyalîst dikin, ku piştigiriya wan bikin" (9).

Di rastiya xwe de, tevgera Agrî di wê demê de ne xweyîye tu makinên çapxanê bûn û jî bo wê yekê jî rojnameya "Agrî" bi desta dihate nivîsandin. İhsan Nûrî Paşa di bîranînên xwe de, bahsa derxistina rojnameya "Gaziya Welat" nakê; lê gava bahsa rojnameya "Agrî" dike, weha dibê: "Min li Agrî rojnameyek bi navê Agrî bi zîmanê kurdî derdixist. Ji bona vî rojname kaxez bi qederê pêwîst nebû, ji ber vî kêmtir derdiket. Çûn çapxane jî nebû bi dest nivîsî, hinek jî bi jelatînî ku li Agrî kelandibûn, sar kiribûn, min li ser wî çap dikir" (10).

Gava İhsan Nûrî Paşa bahsa taktîka şerê Agrî jî dike, xweş diyar dibe ku peywendî û hevîyên wan jî bo alîkariyê jî dewletên din tunebûn. Herweha hesab û planên xwe li ser qewt û canbêzariya xelkê xwe kiribûn: "Qomandarê Kurd, jî hiç cî û navçeyê hevîya yarmetî û pêşkêş nebû, sîlah nedidît erdên dinê bigire, cepheyek fîreh ê şer veke. Dizanibû ku li pêşîya top û firoke û tank ên ordiyên meşqûdî yê tirk bi tîfing, ew jî gerek e ji destên neyar fişengên win bigirin, domanîn hêsa nîne. Ew baş dizanibû ku çiyayê Agrî bi dest ve bigre, bîparêze, bi hoy têkoşerên kurd û bi saya xwe bextkirina niştîmanî ya kurdan hêzên dewleta tirk li navçeyên Kurdistanê berebere biwes-

tîne, ji beyn bibe û bi vî taktîkê nalîna hejaran û hest û îradeya qayim a neteweyê kurd jî bona bîdestxistina azadiya neteweyetî û mirovatî bi guhê alemîya cihanê de, nîfûza siyasî û aboriya Tirkan bi lîzere. Ev bizotîna taktîk li layê navenda Xoybûn pesend kiribûn" (11).

Dema hêzên kolonyalîst yê Tirkan dîtin ku bi şer û zordariya leşkerî tenê nikarin tevgera Kurdî rawestînin, xwestin bi hinek fen û fûtan pêşengên Tevgera Agrî bixapînin. Di nava Gulana 1928- an de, delegasiyonek jî 12 parlamenterê Tirkîyê, Waliyê Karakilîsê û Fermandarê Liqê (tumena) 28- an pêkhatî, pêşneyara hevdîtîne jî pêşengên Agrî re tinin. İhsan Nûrî Paşa bi 60 siwariyên xwe ve diçin civanê hevdîtîne. Hevîya Tirkan ew bû, ku bi hinek sozên taybetî û efa giştî canbêzarên kurdan dev ji têkoşîna xwe berdî. Lê ew plan û listikên dijmin, İhsan Nûrî Paşa nexapand; wî di bersîva xwe de, carek din da diyar kirin ku heta leşkerên Tirkîyê jî Kurdistanê paqîj nekin û serxwebûna Kurdistanê bi dest nexînin, dê têkoşna wan jî berdewam be...

Agrî, êdî weke wîlayetek Kurdistanê serbixwe dihate îdare kirin. İhsan Nûrî Paşa di warê birêvebirina giştî û leşkerî de, hûnandinek nû û taybetî pêk anibû. Rêxistina Xoybûnê jî, serekeşîrê Celalîyan Brahîmê Huskê Tellî bi payeya paşatiyê kiribû Waliyê Wîlayeta Agrî. Ji bo hinek memûrê din jî, ew kesên li jêrîn hatibûn wezîfedar kirin:

Fermandarê Cendirma yê Wîlayeta Agrî: Tamir Exa, Qaymiqamê qeza Korhanê: Mele Husên Efendî, Gerîndeyê (midûrê) nahîya Botî: Brahîm Exa, Gerîndeyê nahîya Ortûlî: Hesen Efendî, Gerîndeyê nahîya Korî: Mûsa Berkilî Exa, Qaymiqamê qeza Koaxanê: Omer Exa (12).

Ew xebat û tekoşîna li Agrî çêdibû, xof û tirsek mezin xistibû dilê Hukûmeta Tirkîyê. Ji bo ku ew tevger bêtir belav nebe, dijmin ketibû nava tatolek û haziriyek pir mezin. Ji hêlekê efên giştî li pê hev derdixist û ji aliyê din jî, hazirîya çekdarî dikir û danûstendin bi dewleta Îranê, û Yekitiya Sovyetan re datanî, ku bi alîkariya wan agirê li ser çiyayê Agrî gûr dibû, ji binî de bifetîne. Hêjaye gotinê ye, ku li dijî wan efên ku dewleta tirk derdixist û dixwest gelê kurd pê bixapîne, tevgera Agrî di hundirê welêt de û rêxistina Xoybûnê jî li derveyî welêt, kampanyek mezin dest pê kiribû. Li ser wan efan, gelek

belavok û bulten hatin belav kirin û di wan weşanan de, durûtî û derewên dewleta tirk ji xelkê kurd re dihate diyar kirin.

Hukûmeta Tirk, di bin serokatiya Salih Paşa de, bi hêzek ji 40 hezar leşker, 10 batarya top, 500 mitralyoz û 50 belafirkar pêkhatî, di 11 Hezîrana 1930- an de êrişî ser hêzên neteweyî yên kurdan dîke. Di wan şerên ku di navbêna 11 û 20 Hezîranê de çêdibin; hêzên kurdan 5 belafirkên Tirkiyeyê dixînin û wek xenîmet jî, 30 mitralyoz, barê 60 devan cebîlxane, 500 çadir dikeve destên Kurdan. Di şerê navbêna 20 ê Hezîranê û 27 ê Tîrmehê jî, Tirk bi ser nakevin; 800 leşkerên wan tê kuştin, 2000 birîndar dibin û 700 leşker esîr tê girtin.

Ji ber ku leşkerên Tirk, di wan şerên ku bi mehan ajot tu serketinên girîng bi dest nedixistin; bi navê "serastkirina sînor" perçakî erdê Wilayeta Wanê ji Îranê re hiştin; Li hemberî wî tiştî jî, alîkariya Îranê girtin û bi wî awayî tîkiliyên qahremanên Agrî, ji her alî de hate birîn. Teva ku tîkoşerên kurdan bi heftan tehamulî birçûbûnê kirin jî, şert û mercan domandina şer bê îmkân bûbû. Ji bo malbat, zarokên birçî û perîşan mabûn ji mirinê xelas bikin; mixabin tîkoşerên Kurdan neçar man, ku dev ji Agrî berdin û îlticayî erdên Hukûmeta Îranê bikin (13).

Di wî warî de, Îhsan Nûrî Paşa di bîranînê xwe de weha dibê:

"Dewleta Tirkiyeyê gelek caran bi hêz û qewta xwe hewil da ku Rizgarîxwazên Kurdan ji Agiriyê derxînin û şoreşa Kurdistanê bitefîne. Gava bi ser neket, muhatacî alîkariya derve bû... Dewleta Tirkiyeyê, xebat û hewildanên xwe yê siyasî û diplomati zêdetir kiribû û dostê xwe yê berê, Dewleta Rûs bi derew û propagandayên şaş kişandibû aliyê xwe. Hevdîtînen di nava Wezaretê derve ya Ankarayê Balyoxxana Îranê yê di derheqê Agrî de, di zerara Kurdan de dom dîkir."

"Yekitiya Sovyetan, gelek leşker li ser sînorên Agrî û Îranê bi cî kiribû. Dewleta Îranê jî, li navçeya Makoyê îdara awarteyî dimeşand..." (14).

"Komunist Partiya Tirkiyê" jî, li dijî tevgera rizgarîxwazî ya Agrî, çî ji dest dihat teksîr nedikir û di wî warî de nedixwest ku ji Burjuvaziyên xwe yê nîjadperest û kolonyalist kêmbimîne:

"Ji ber ku di warê aborî de, Wilayeta Rojhilatê (devê wan nedigeriya, ku bibêjin Kurdistan. M.P.) paş de maye

û senayî hema-hema tune, em dizanin ku feqîrên kurdan her gav di bin tesîra xelîfeparêzî, paşverûtiyê û emperyalîzmê de mane. Îro jî feqîrên Kurdan, li dijî berjewendiyên (menfaetên) xwe rola maşa paşverûyan dilîzin..." (15).

"Komunist Partiya Tirkiyê" wan nerînên xwe yê şovenîst wek rapor pêşkêşî Komunist Enternasyonalê jî dîkir û dixwest ku wê tevgera neteweyî, paşverû nîşan bide û bi her awayî wê tenê bihêle. Ji xwe gava mirov li nerînên Komunist Enternasyonalê jî dînerê; bi hêsanî tê dîtin, ku bîrûbaweriyên "Partiya Komunist ya Tirkiyê" û "Komunist Enternasyonalê" di wî warî de hevdu digrin: "Ew serhildanên li Tirkiyê, Îranê û li bakurê Iraqê li navçeya Musilê ku bi mêldariya şîra "Azadiya Kurdistanê" tê xuyanê kirin, ji aliyê Îngilîzan tê pêş de ajotin, çekdar kirin û fînanse kirin. Armanç; di navbêna Tirkiyê, Îranê, Iraqê û Yekitiya Sovyetan de dewletek tampon ku bi her awayî di bin destên Îngilîzan damezirînin û wê li hemberî Yekitiya Sovyetan wek navendiyek leşkerî bi kar binin" (16).

Li ser rewşa dawî ya tevgera Agrî, Îhsan Nûrî Paşa raporekê pêşkêşî Navendiya Xoybûnê dîke û daxwaza alîkariyê dîke. Navendiya Xoybûnê jî, li ser wê daxwazê û ji bo barê berxwedana Agrî sivik bike, biryar dide ku ji aliyê başûr ve li hemberî hêzên Tirkiyê dest bi şer bikin. Lê mixabin, teva hinek erîşên biçûk û hewildanan jî, ew planê Xoybûnê bi awakî giştî ne gihast armanca xwe û bi ser neket (17).

Îhsan Nûrî Paşa, di bîranîn xwe de li ser tîkiliyên di nava navçeyan û şerên biçûk yê herêman, weha dinivîsîne: "Firehiya hêlsana neteweyî ya kurd li pênavê Agrî ta sînorên Iraqê û Sûriyê dikêşa. Ev raperîn her mexsûsê navçe û dor û berê Çiyayê Agrî nebû. Tenê hêzên Agrî vê navçeyê dagir kirî, îdareyek azad a kurdî çêkiribû û ala serbixoyî ya Kurdistanê daçikandibû. Di navçeyên Kurdistanê yê din de desteyên canbêzarên binecî yê kurd çêse çete dixebitîn" (18).

Ji wan daxuyinan jî diyar dibe, ku ji derveyî Agrî û heta derecakê der û dora wê, di navçeyên din yê Kurdistanê de tevgerêdan û rêxistinîyek bi rêk û pêk û xurt tunebû. Teva ku li hinek navçeyên din hinek şerên biçûk li dijî kolonyalistên tirk berdeham jî bûn; ji ber tunebûna rêxistinîyek giştî û bi rêk û pêk li Kurdistana Bakur û ji ber tîr-

nekirin û hejariya danûstendinên di nava navçeyan de; ew şerên biçûk û berxwedanên li navçeyên din, nedibûn çeper û astengên girîng li pêşiya hinek planên dewleta Tirkiyê. Loma jî, dewleta Tirk bi hêsanî dikaribû giraniya hêzên xwe yê leşkerî li ser serê canbêzarên Agrî kom bike û bi alîkariya dewletên cîran ve, wê tevgêrê bi tenê bihêle û îzole bike.

Piştî şikestina tevgera Agrî jî, rêxistina Xoybûnê hinek çalakî û xebatên xwe da domandin. Lê her ku diçû, ji wê qewt û hêza xwe ya berê diket. Nakokiyên di nava pêşengên Xoybûnê ku ji malbatên mezin û navdar dihatin, roj bi roj diwartir dibûn. Ji xwe pêşengiya Xoybûnê jî destpêkê de, di giraniya derebeg, xwedîerd û aristokratên kurda de bû û piştî demekê nakokiyên mezinatiyê di nava wan de, ji nû de dest pê kiribûn. Weke tê zanîn di wan rêxistinê kurdan ku di destpêka salên 1900- an de û li Stenbolê hatibûn damezrandin jî; berberî û nakokiyên weha di nava malbatên navdar û derebegan de derketibûn. Di dema dawî de, Xoybûnê di ji rêxistinîyek bi rêk û pêk wêdetir, weke hawêreke siyasî mabû. Li gorî agahdariyê Ekrem Cemil Paşa dide; "Di sala 1946- an de, Komara Mehabadê tê damezrandin. Weke hemû rêxistinên kurdan rêxistina Xoybûnê jî, îltihakî Komara Mehabadê dîke" (19).

Lê di wî warî de, hinek agahdariyên ku Zinar Silopî (Kadrî Cemil Paşa) dide, cihê ne: "Piştî Şerê Cihanê yê duyemîn ku Dinya xistibû nava xwe, heta ku guherandinên di rewşa siyasî ya dewletan û ihtimala guherandina nexşa dinyê zelal bibe, Xoybûnê xebatên xwe da rawestandî. Di dawiya şer de, armanca rêxistina Xoybûnê edî ne wek ya berê ku perçên Kurdistanê yê di bin destê Hukûmeta Tirkiyê de rizgar bike; ihtimal û daxwaza hemû perçên Kurdistanê bikin yek û ji bin destên biyaniyan derxînin hebû..." (20). Li gorî çavkaniya leşkerî ya Dewleta Tirkiyê ku me berê nivîsibû jî: "Xoybûnê hebûna xwe heta sala 1939- an domandiyê".

Di sa li gorî agahdariyên Zinar Silopî dide; ew di 21- ê Îlona 1946- an de, li ser navê kurdên Sûriyê û wek nûnerê "Partiya Demokrat ya Kurdên Sûriyê" daxwaz û nerînên xwe bi nameyekê pêşkêşî Qadî Mihemed dîke. Herweha Zinar Silopî di nameya ku pêşkêşî Konsulosê Tebrîzê yê Yekitiya Sovyetan dîke, xwe wek nûnerê "Partiya De-



mokrat ya Sûriye û Tirkîyê" nişan di-de. Lê gava ew bahsa çûna xwe ya Mehabadê dike; li ser rewşa rêxistina Xoybûnê tu agahdariyê nade (21).

Ji derveyî agahdariyên ku Zinar Silopî diyar dike; ez bi xwe li tu çavkanî û dokumentên din rast nehatim, ku di wê demê de "Partiya Demokrat ya Kurdên Sûriyê û Tirkîyê" hatiye/hatine damezirandin. Qasî ku ez dizanim; di wê demê de bi wî navî ne li Kurdistana Sûriyê û ne jî li Kurdistana Tirkîyê tu rêxistin nehatin ava kirin. Lê dibe ku hinek ronakbîr û kadirên kurdan, di bin tesîra damezirandinê Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê û Kurdistana Iraqê û Komara Mehabadê de mabin û xwestibin li wan perçên din jî, "Partiya Demokrat ya Kurdistana" damezirînin. Heger tişteki weha hebe jî; ew di nava derdorek pir teng de maye û wek rêxistinê cî negirtiye. Ji xwe; di derheqê program, destûr û jiyana rêxistiniya wê ya jî wan partiyan de, Zinar Silopî bi xwe jî, tu agahdarî nedaye. Li ser rewşa wê demê, Dr. Heinz Gstrein weha dinvîsîne: "Gava Fransiyayê di sala 1946- an de Sûriye bi tevayî vala kirin, kurd bê hazirî bûn û rêxistinên wan yê siyasî tunebûn..." (22).

#### DAMEZIRANDINA "PARTIYA DEMOKRAT YA KURDISTANA SÛRIYÊ"

Di nava salên 1954 û 58 an de, karbidestên Sûriye çavên xwe heta derecê jî nerîn û birûbawerî gotinê û xebata "Partiya Komînist Ya Sûriyê" (PKS) rê digirt. Gelek kadirên kurdan jî di nava wê rêxistinê de dixebitîn û ne pir zêde be jî, tesîrek wê li ser kurdên Kurdistana Sûriyê hebû. Xebata "Yekîtîya Xortên Demokrat ya Kurdistana Sûriyê" jî, di derdorek pir teng de dima û hebûnek berbiçav nişan nedida. Di wê navbêne de, têkiliyên tevgera Kurdistana Iraqê û Hukûmeta Misrê bi hevdu re çêbûbû û li Misrê radyoyek kurdî dest bi weşanê kiribû. Misrê dixwest ku hinek çalakîyan li Tirkîyê û Îranê jî bike. Bê guman ew nêzîkî û "dostaniya" Misrê, ne jî bo çavên reş yê Kurdan bû. Gava mirov li rewşa wê demê ya Rojhilata Navîn û nakokiyên di nava dewletên Ereban û Îsraîlê dine-re û dide ber çavan, niyet û armancên Misrê jî bêtir derdikevin holê.

Ew nêzîkiya ne jî dil û "dostaniya" Misrê, tesîrek li ser Kurdên Kurdistana Sûriyê jî dikir. Partiya Demokrat ya Kurdistana Iraqê jî dixwest ku li Kur-

distana Sûriyê û Tirkîyê, "Partî" bête damezirandin. Ji bo wê armancê, di sala 1956- an de hinek têkilî di nava kesên siyasî yê Kurdistana Sûriyê de çêbûbûn. Çend kadirên "Partiya Demokrat ya Kurdistana Iraqê" (PDKI) jî, di wê demê de li Sûriyê bûn. Pêşneyar û nerînên wan yê di warê damezirandinê rêxistinêk weha de, danûstendinên ku jî bo ava kirina "Partiya Demokrat ya Kurdistana Sûriyê" germtir û berfirehtir dikir. Di wê demê de hinek kadirên kurd yê navçeyê "Kurdaxê" jî, jî "Partiya Komînist ya Sûriyê" (PKS) veqetiyabûn û dixwestin beşdarî nava wê xebatê bibin. Di encamê wan têkilî û hazirîyan de û bi beşdariyan wan kadiran, di 14-ê Hezîrana 1957- an de "Partiya Demokrat ya Kurdistana Sûriyê" (PDKS) bi nependî (dizî) hate damezirandin (23). Hinek damezrevanên PDKS ew bûn: Dr. Nurettin Zaza (Sekreterê Giştî), Osman Sebrî, Hemîd Hecî Derweş, Reşîd Hemo, Şewket Henan û Hemze Newêran, Şêx Mihemed Îsa.

PDKS bi şîra "Rizgarî û yekîtîya Kurdistana" dest bi xebatê û têkoşîna xwe ya siyasî kir. Lê dûre, navê Partiyê hate guherandin û kirin "Partiya Demokrat ya Kurd Li Sûriyê". Ji derveyî guherandina navê Partiyê, nerînên Partiyê yê siyasî jî hate guherandin. Ji şûna nerînên berê; armanca bi destxistina mafên kulturî, demokratîk û îdareyek herêmî ya sînorkirî hate qebûl kirin.

Li gel hebûna nerîn û birûbaweriyên çep, pêşengiya Partiyê di giraniya halxweşên Kurdan de bû û Partiyê jî hemû çîn û tebaqan kesên niştîmanperwer di nava xwe de civandibû. Teva ku PDKS xwe wek partiyek çep û gelek endamên wê xwe Marksist didît jî; lê di rastiya xwe de ew partiyek neteweyî û demokrat bû. Piştî damezirandina PDK jî, hinek kadirên kurdan ku di nava "Partiya Komînist ya Sûriyê" de dixebitîn, jî wê veqetiyên û beşdarî nava PDKS bûn.

Dema ku PDKS hate damezirandin, PDK- Îranê ne pir bi hêz bû û li Kurdistana Tirkîyê jî, hîn Partî nehatibû damezirandin. PDKI vatiniya ku alîkarî û piştigiriya PDKÎ bêtir bi hêz bike da ser milên xwe û Partiya Kurdistana Sûriyê jî, wê jî bo damezirandina Partiya Demokrat ya Kurdistana Tirkîyê hewl bida. Ji bo wê armancê hinek kadirên PDKS li Kurdistana Tirkîyê, li hinek cihên nêzîkî "sînorê" Kurdistana

Sûriyê dixebitîn û çend komikên danûstendinê ava kiribûn. Lê ew xebat û hazirî ne gihastibû wê qonaxa damezirandina "Partiya Demokrat ya Kurdistana Tirkîyê".

#### ERÎŞA SER PKS Û GIRTINA ENDA-MÊN PDKS

Di sala 1958 an de, Sûriye û Misrê bi navê "Komara Yekbûyî ya Erebb" bûbûn yek. Ew yekîtîya heta 28-ê Îlona 1961-ê domand. Di despêkê de, Nasir çavê xwe hinekî jî "Komunistên Sûriyê" re digirt û PKS jî Nasir pêşverû û anti-empyralist nişan dida. Lê pir derbas nebû, Nasir rûyê xwe yê rastî derxist holê û di sala 1959- an de êrişek dijwar anî ser Komînist Partiya Sûriyê û gelek endamên wê girtin. Li ser wê kiryarê, PDKS daxuyaniyeke hundirî di nava endamên xwe de belav kir ku endamên wê li kesên KPS xwedî derkevin û wan biparêzin. Herweha Partî li dijî wan kiryarên Nasir derdiket, ew bi tundî rexne dikir û bi dîktatoriyê gunehkar dikir. Ji xwe, jî bo PDK rêxistinêk têkoşer dihate dîtin û di nava xelkê Kurdistana Sûriyê de roj bi roj bêtir belav dibû, Hukûmetê dixwest darbeyekê li PDK jî xîne. Piştî alîkariya kadirên KPS û şerkirina li dijî wan kiryarên Nasir, jî Hukûmetê re kêla mana tije bûbû û 13 Tebaxa 1960-ê de, dest bi girtina kadirên pêşeng, endamên Partiyê û niştîmanperwerên kurdan kirin. Partî li hemberî êrişek weha bê hazirî bû û tedbîrên xwe xweşik negirtibû. Ji derveyî du endamên Lijna Navendî û endamekî Polît Broÿê hemû endamên Navendî û li derdora 100 endam û kesên nêzîkî Partiyê, di demek pir kin de hatin girtin. Ji nava wan 32 kes şandin Şamê û xistin zindana Mezê. Hinek kes li derdora Helebê hatin girtin, piştî demekê hatin berdan. Li navçeyê "Cizîrê" jî gelek hatin girtin û berdan (24).

Ew girtina di dîroka PDK de, bû qonaxek taybetî û destpêka gûrbûna nakokiyên û tovê veqetandin û çêbûna grûban. Di zindana Mezê de, di warê parastin û neparastina birûbaweriyên Partiyê de jî dîbendî û nakokî hebûn. Piştî dadgehê; jî dervî endamên Komîta Navendî û Herêmî, piraniyê girtiyan hatin berdan. Kesên ku nehatin berdan, di navbêna 11 meh û 1,5 salan de ceza xwarin.

Di 8-ê Tebaxa 1961- an de Sekreterê Partiyê Dr. Nûretîn Zaza hate berdan û xwe jî bona hîlbijartina parlamentoyê nişan da. Ji bo ku di propo-

ganda hîlbijartinê de bi kurdî peyivbû, dîsa hate girtin. Teva ku di hîlbijartinê de hate hîlbijartin jî, ji ber "wê sedemê" parlementerîya wî nehate qebûl kirin (25).

### "KEMERA EREBÎ" Û ARMANCÊN WÊ

Di sala 1961- an de, tevgera siyasî ya Kurdistanê Sûriyê di warê kutlewî de gelekî xurt bûbû û pêş ve diçû. Bê guman di wê xurtbûnê û pêşveçûnê de, rola Şoreşa Kurdistanê Iraqê jî hebû. Rojnameyên Sûriyê dinivîsîn, ku kurd dixwazin "li Cizîrê Israîlek dîda" çêbikin. Wer xuyabû ku tirs û xofek tabetî ketibû dilê karbidestên Sûriyê. Ji ber wê yekê; Serokê Îstqbarata Sûriyê Wîlayeta Hesekê, **Mulazim Muhemed Teleb Hilal** di sala 1961- an de, li ser kurdên li navçeya "Cizîrê" dest bi lêkolînek pîralî û berfireh kir. Encamên wê lêkolînê û pêşneyarên xwe di 12 xalan de pêşkêşî Hukûmetê kir. Di nava wan pêşneyarên wî yê herî balkêş yek jî, pêkanîna "Kamera Erebî" bû.

Di vê derheqê de; ji aliyê "Komela Xwendevanên Kurd Li Ewropa - Liqê Çekoslovakya" û bi navê "Li ser rewşa gelê Kurd li Sûriyê" berhevokê hatiye belav kirin. Li gorî wê berhevokê, pêşneyar û daxwazên Muhemed Teleb Hilal bi kurtayî weha bûn:

\* Divê Hukûmetê kurdan ji cihê wan rakin û li hundirê Sûriyê belav bikin.

\* Dibistan û Unîversîteyên girîng li Cizîrê neyê ava kirin.

\* Li Cizîrê deriyê kar li ber kurdan bê girtin.

\* Nifûsên kevn ji nû de bête rast kirin; yê ji aliyê Serokatiya Cîmhûrî nehatibin qebûl kirin, wek hemwelatî neyê qebûl kirin û bê biryara Serokatiya Cîmhûrî kes nikaribe bibe hemwelatî.

\* Xwedîtîya erdan ji destên kurdan bê girtin. Ereb hene ku xwedîtîya wan erdan bikin.

\* Propogandeyek berfireh di nav ereban de bête kirin, ku ruhê wan yê erebî geş bibe û bikaribin di navçeyên kurdan de bi cîwar bibin.

\* Leqebên olî ji destên kurdan bête girtin û di şûna wan de şêxên Ereban bête şandin.

\* Nakokiyên di nava kurdan xînin, ku ew xwe bi xwe pevkevin.

\* Erebên nijadperest li ser sînor bi cîwar bikin, ku heta em kurdan ji wan deran rakin, kontrolê li ser kurdan

bikin.

\* Xeta Bakur ya Cizîrê em bikin navçeyek leşkerî; ereban li wir cîwar bikin û kurdan ji wê dere rakin. Ji bo pêkanîna wî tiştî jî, lêkolîn û planek bête amade kirin. Li ser wê xetê, bi destên dewletê kooperatîfên erebî bête ava kirin. Erebên li wir bête bi çek kirin û perwerde kirin.

\* Kesên ku bi zîmanê erebî nizani-bîn, divê heqên wan yê dengdanê û hîlbijartinê tune bin.

\* Divê em hemwelatîya Sûriyê nedin wan kesên ku ne xurî ereb bin û bixwazin li wê derê bimînin (26).

Di 5 ê Tebaxa 1962- an de, jimartînek nifûsê ya taybetî li Kurdistanê Sûriyê, li navçeya "Cizîrê" hate çêkirin. Di encamê wê jimartinê de, hemwelatîya li derdora 100 000 kurdan ji dest hate girtin. Ew kesên ku hemwelatîya wan ya Sûriyê jî dest hatin girtin; li gel wan heqên ku ji hemwelatîyên Sûriyê re hebûn wenda kirin û êdî nikaribûn bibana xwediyê erd û avayîyan jî...

### VEQETANDINA NAVA PARTIYÊ Û "KONGREYA YEKITIYÊ"

Nakokî û dijîtiyên ku di zîndana Mezê de rû dabûn, piştî berdanê jî dom dikir û roj bi roj gûrtir û dijwartir dibûn. Piştî sala 1962- an, bîngeha veqetandinê hêdî hêdî dihate danîn û du mîldarî di nava PDKS de dihate dîtin: "Baskê Çep û Baskê rast". Lê heta sala 1965- an jî, ew nakokî û baskên hebûn di nava Partiyê de mabûn û hîn awakî fermî negirtibûn.

Di sala 1965- an de, bi awakî eşkere veqetandin di nava "Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê" (PDKS) de çêbû; "Baskê Çep" bi serê xwe kongreya xwe çêkir û bi navê "Partiya Demokrat ya Çepê Kurdên Sûriyê" rêxistinîna xwe damezrandin.

Li gorî Salah Bedrettîn têza bîngehî ya "Hêza Çep" weha bû: "Di şoreşa Kurdistanê de, pîrsa neteweyî û çînî ketînin nav hev û ew herdu pîrs bi hevîrêdanekê ku ji hevdu navê veqetandin bi hevdu ve girêdayînin" (27). Dîsa li gorî Salah Bedrettîn: Baskê "çep" jî bo Kurdên Sûriyê "netewe" digotin. Baskê din ew "eqeliyet" dihesibandin. Baskê ku bi "rastiyê" dihate navkirin, li gel "parastîna mafên hemû kurdan" bûn. Lê baskê "çep", jî "bîngehgirtîna karker û gundiyên Kurdan" bahs dikirin... (28).

PDKS jî, di sala 1966- an de Kongreya xwe ya yekem û di dawîya Îlona

1969- an de jî Kongra xwe ya duyem çêkir. Di Kongreya Duyem de progamêk jî pêsgotînekê û 20 xalen pêkhatî tê qebûl kirin. Di wê pêsgotînê de; li ser rewşa dinê, pesnê Şoreşa Oktobirê û pişgiriya tevgerên neteweyên bindest, girîngî û pêwîstîya kurdan di pêsketîna Sûriyê de, girîngiya biratiya kurd û ereban û pêwîstîya hevkarîya li dijî emperyalîzmê tê rawestandî; Partiya Demokrat ya Kurd, hevîya neteweya Kurd û garantiya bicîfanîna daxwazên wî nîşan dide. Hinek nerînên bîngehî yê PDKS jî, di wê programê de weha hatînin diyar kirin:

"1) Partiya Demokrat ya Kurd li Sûriyê, li ser bîngehê gelî ji gundîyan, karkeran, ronakbîran û kesên din pêk tê û partiyek demokrat, civakî û têkoşer e. Xebata xwe li ser bîngehê gelî û di bin ronîya teoriya ilmî de dimeşîne."

"4) Partî jî bo rakirina hemû tedbîrên faşîst, di welêt de garantîkirina meşandîna sistema îdareya navçeyî û di navçeyên ku kurd lê dijîn, hebûna wan ya neteweyî li ser bîngehê tevayîya neteweyî bête qebûl kirin, dixebite."

"6) Partî, ji bo gihastîna heqên neteweyê kurd yê siyasî, civatî û kulturî dixebite."

"20) Partî, şerkirina li dijî her awayên emperyalîzmê, nokerên wan yê başverû, feodalîzmê û kapîtalîzmê dixwaze" (29).

Di sala 1970- ê de, hewldanek çêbû ku ew perçebûn û dijîtiya di nava tevgera rêxistinîna Kurdistanê Sûriyê jî holê rakin. Di wê demê de, şoreşa Kurdistanê Iraqê geş bû û tesîrekê wê ya taybetî li ser perçên din hebû. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Iraqê dixwest ku li Kurdistanê Iraqê kongreyek yekitiyê di nava rêxistin û grûbên Kurdistanê Sûriyê çêbike û dijîtiyên ku di nava wan de gûr bûbûn çareser bike. Li ser gazîkirina PDKI, di 26- ê Tebaxa 1970 ê de, li Kurdistanê Iraqê "Kongre Yekitiyê" hate civandin û di wê Kongreyê de Komîteyek Navendî ya hevbeş hate hîlbijartin. Lê ew "yekitiya" ku di wê civînê de çêbûbû, di pratîkê de nemeşîya. Nakokî û dijîtiyên ku di nava tevgera rêxistin û grûbên Kurdistanê Sûriyê de hebûn çareser nebûn û pêşîya nakokî û veqetandinê nû nehate birîn...

\*\*\*

(Çavkanî û Têbînî di rûpela 10-an de ne).



## NEWROZ PÍROZ BE

Di van rojên ku em cejna Newrozê pîroz dikin, tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê bi gelek bûyerên erênî û neyînî ve, di pêvajoyek zor girîng û taybetî de derbas dibe.

Xebat û tekoşîna gelê me teva hemû asteng û êrîşên dijmin jî, li gel şerê çekdarî bi gelek awayî dom dike. Gelê Kurd li Tirkîye, Îran, Iraq û Suriyê di bin şert û mercên pir giran de dijî û tekoşîna xwe di wan şertên giran de didomîne.

Kurdîstana Başûr piştî wan jan û dijwariyan û wêrankirina gund û bajaran, ditêkoşe ku birinên xwe bipêçe û welatê xwe jî nû ve ava bike. Di vî perçê Kurdistanê de, gelê me di warê aborî, siyasî û civakî de di nava dijwariyan pir giran de ye. Lê teva hemû dijwariyan jî, moralê gelê me li Kurdîstana Başûr bilind e. Gelê me xwe amade dike, ku di meha Nîsanê de gavek dirokî bavêje. Hilbijartinên Nîsanê, di diroka tekoşîna neteweyî ya Kurdistanê de, wê hilbijartina yekemîn ya eşkere, fermî û demokratîk be. Bi vê hilbijartinê, wê xebat û tekoşîna gelê me di warê neteweyî û navneteweyî de rewş û statuyek nû bistîne. Hêvî û daxwazên me ew in, ku hêzên niştîmanperwer yên Kurdîstana Başûr Hilbijartina Nîsanê bi awakî demokratîk, adil û hevbeş bike serketinek gelê me yê Kurdîstana Başûr.

Ji Şerê Xelîcê û vir de, Saddam dîsa dixwaze hêza xwe ya leşkerî bicivîne ser hevdu û ji bo pêşîya wê hilbijartinê bigre, di nava haziriyên êrîşek nû de ye. Hilbijartina Nîsanê ne hew Seddam di-tirsîne, herweha xewa dewletin Kolonyalist yên din jî direvîne. Bi taybetî Dewleta Tirk, li hemberî wan bûyerên ku li Kurdîstana Başûr çêdibin, niyet û armancên xwe yên êrîşker û dagîrker roj bi roj bêtir derxine holê.

Li Kurdîstana Bakur jî, tekoşîna gelê me bi awakî berfireh û kutlewî di qonaxek nû de derbas dibe; Kurdistan di pêvajoyêke ku şiyarbûnek mezin ya neteweyî û civakî de, dijî. Bi pêşketina tekoşîna gelê me ya neteweyî û demokratîk, dewleta kolonyalist jî plan û provaksiyonên nû li dar dixîne; zîlm û zordariya li ser gelê kurd dijwartir di-

